

Hikûmeta Eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê



27.05.2020
Rûpela 1 ji 3yê

Pressestelle Staatskanzlei
40213 Düsseldorf
Têlêfon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

Danxuyandina Çapemenîyê - 417/05/2020

Gavên pêştir ên Pîlanê Bakurê Ren-Vestfalyayê tên xistin rewacê – rêlibergirtinên parastina ji Koronayê li gora mebestê tên lihevanîn

Li gora bi biryara hikûmetên Federal û Eyaletê li hev were di nava gelî de kêmkirinên gešta heta deh kesan tên hilanîn/Bi şertê pêkanîna qaydeyan çûna sînemayê û çalakîya kulturî, sporên komî û demserbest êdî dê mumkin bin.

Hikûmeta eyaleta vê dide zanîn:

Di 30ê Gulana 2020î roja Şemîyê de, wek perçeyekî pîlanê hikûmeta eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê li Bakurê Ren-Vestfalyayê dê rêlibergirtinên li dijî koronayê êdî bêtir bên sistkirin. Di nava van de, digel tiştên din, li gora lihevkirina paşîn a hikûmetên federal û eyaletê bihevxitinî hene ku bihêlin kêmkirinên bihevbûnên komên heta deh kesan bên sistkirin û ji bilî van li sînemayan, tîyatroyan, operayan û eywanên konsertan û li dezgehên din ên kulturî yên gelêrî û taybet tevî çalakîyan pêşbirkên sporên komî û yên zemanê vala bên kirin.

Serekwezîr Armin Laschet weha gotiye: “Ji vebûnên wan ên pêşîn ên 20ê Nîsanê ve jimara enfeksiyonên rojane ya nû ya Bakurê Ren-Vestfalyayê bêtirî ji sedî 75an kêm bûye. Digel ku ev jimar di meha Nîsanê de hema hema di hefteyê de bêtirî 500î bû, lê îro di seranserê welêt de 102 ye. Mala mirovên li welatê me hezar car ava be. Di têkoşîna bi şova Covid19ê de tevgera pirranîya wan a bi berpîrsîyarî û maqûl kir ku me di pîlanê xwe yê Bakurê Ren-Vestfalyayê de gavên çêtir bi pêş ve avêtin. Bi saya vî awayî em proseya vekirinê ya bi tevdir

dikarin dewam bikin û gava din a bi berpîrsîyarî ya ji bo pêş dikarin biavêjin. Em ê hê jî bi wicdan û berpîrsîyarîya xwe bixwe ya mirovên welatê xwe ewle bibin. Li her cîhê hûn lê ne heta mumkin be parastina navbera xwe û ji xwe û kesên din re tevgerîna bi berpîrsîyarî hê jî giring e.”

Pîlanê Bakurê Ren-Vestfalyayê, li gora proseya bipêşveçûyîna rewşa enfeksiyonê di çarçoveya zanyarîyên xuyandî yê mebest de di warên cuda de hin astên cuda yê divên pêk bînin. Ev nihêrîn, digel parastina sihheta Bakurê Ren-Vestfalyayê, ji bo jîyana aborî û gelêrî texmînin û bawerîyê pêşkêş dike. Vebûn, bi bi awayekî daîmî nirxandina bipêşveçûna proseya enfeksiyonê û bi awayekî eşkere qeydkirina wê dê pêk bînin. Zanyarîyên diyarkirî, zanyarîyên mebest ên dibin hinek şaş bibin.

Bihevxiştina qanûnî ya binavkirî di 27ê Gulana 2020ê roja Çarşemê de hat diyarkirin û dê di 30yê Gulana 2020ê de bikeve rewacê. Îlgili yasal düzenleme 27 Mayıs 2020 Çarşamba günü açıklandı ve 30 Mayıs 2020'de yürürlüğe girecek. Ew dibe di vê navnîşanê de bê dîtin www.land.nrw

Bihevxiştinên nû bi hûrgilî

Emrê Qanûnî yê Eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê ji 30yê Gulana 2020ê pê de van sivikayîyan pêşkêş dike:

1. Kêmkirinên bihevvebûnê û qaydeyên tevgerê

Kêmkirinên heyî yê bihevvebûnê li gora biryara 26ê Gulana 2020ê de di nava hikûmeta federal û hikûmetên eyaletê de dê hê bêtir jî bê bipêşvebirin. Wisa ku bere tevî konstelasyonê (malbat yan du mal), di warê gelêrî de dê komeke ji deh kesan pêkhatî karibe kom bibe. Ev awa bi şertê peyderkirina taqîbkirina kesên kombûyî tê pêkanîn.

Tevî vî awayî, di hin cîhan de tevî mecbûrîyeta maske dev-difnê jî, dê bi qaydeyê navbera 1,5 metreyî dîsa bê pêkanîn.

2. Dezgehên kulturê

Sînema, tîyatro, opera û eywanên konsertê, bi şertê ku ew qaydeyên paqijîyê û enfeksiyonê pêk bînin dê dîsa karibin ji serdêran re bînin vekirin. Ev di heman demê de ji bo çalakîyên hewayê vekirî jî di rewacê de ye. Eger tevîbûyîna ji kapasîteya her car a çareyekê bêtir be

yan bêtirî 100î de, jê re awayekî parastina taybet a paqijîyê û enfeksîyonê divê.

Rûpela 3 ji 3yê

3. Spor

Di çarçoveya kêmkirinên bihevvebûnê de komên kesên destûra wan a hevdîtinê hatibe dayîn dîsa destûra wan hatiye dayîn ku sporên hewaye vekirî bikin. Di vê çarçoveyê de bi şertê ku qaydeyên mercên paqijîyê û enfeksîyonê pêk bînin, li gora şertan tevî bikaranîna odeyên guherandina cilan û dezgehên sihhî jî, dê destûra sporên kêfê û hewaye vekirî dîsa bê dayîn. Herweha çalakîyên wek spor, antrenman û pêşbirkên ku di wan de bihevvebûn bivênevê ne qedexeyê ne. Karxaneyên wek meydan, hewzên soberîyê/avjenîyê/melevanîyê, hewzên avjenîyê yê sergirtî dê karibin dîsa dest bi çalakkûna xwe bikin.

4. Xizmetên bêhnvedanê

Bi şertê parastina mercên enfeksîyonê geşta otobusê dîsa mumkin e. Xwandinkar, **bêhnvedana xwe ya havînê** bi şertê pêkanîna emrên qanûnî yê paqijîyê û parastinê, dê karibin wek geştên rojane, bêhnvedana kêfê, geşta bajêr û geştên navberdirêj dîsa pêk bînin.

5. Pêşangehên bazirganîyê, kongre û konferans

Bi şertê pêkanîna awayê parastina pêşangehên bazirganîyê, destûr ji lidarxistina pêşangehên bazirganîyê, kongreyan û konferansan re tê dayîn.

Ev danxuyandina çapemenîyê di înternetê de di vê sîteya înternetê ya hikûmeta eyaleta de jî dibe bê dîtin www.land.nrw.

Danzanîna ji bo parastina zanyarîyên bi çapemenîya civatî re têkildar